Ez

Navê min Dîjle ye. Ez deh salî me.

Ez diçim pola çaran. Çavên min qehweyî ne.

Porê min jî qehweyî ye. Bejna min 130 cm ye.

Giraniya min 38 kg e.

Şalê min şîn, fanêreyê min spî û gewr e.

Solên min reş in. Ji çîrokên zarokan û mûzîkê hez dikim. Ez dixwazim bibim xaying.

Navê min Ozan e. Ez yazdeh salî me.

Rengê çavên min qehweyî ye. Porê min reş e.

Ez ji kincên zer, gewr û spî hez dikim.

Kêfa min ji goştê birajtî û selateyê re tê.

Bejna min 140 cm ye. Giraniya min 40 kg e.

Ez heroj gogê dileyîzim.

Navê min Dîlan e.

Rengê çavên min reş e.

Porê min kestaneyî ye.

Ji rengên mor û şîn hez dikim.

Ez ji demsala biharê û kulîlkan pir hez dikim.

Beybûn, rihan, sosin, pîvok û binevş kulîlkên ez herî zêde ji wan hez dikim in.

Bavê min her tim ji min re dibêje: “Kulîlka min”.

Navê min Robîn e. Ez yazdeh salî me.

Ez diçim pola pêncan.

Rengê çavên min şîn e.

Rengê porê min kej e.

Loma hevalên min ji min re dibêjin Kejo.

Ez dixwazim bibim pîlot.

Nav û paşnav: ....

Van gotinan hînbibin!

pol	bejn	giranî	gewr	çîrok	xaying
kestaneyî	birajtî	şîn	demsal	kej	pîlot

Pirsên li jêr bibersivîne!

1. Dîjle çend salî ye?

.....

2. Dîjle diçe pola çendan?

.....

3. Dîjle ji çi hez dike?

.....

4. Rengê çavên Ozan çawa ye?

.....

5. Ozan ji kincên çawa hez dike?

.....

6. Bejna Hozan çend cm ye?

.....

7. Rengê porê Dîlanê çawa ye?

.....

8. Bavê Dîlanê jê re dibêje çi?

.....

9. Robîn diçe pola çendan?

.....

10. Robîn dixwaze bibe çi?

.....

Nav û paşnav: ....

Tu jî xwe bi hevalê li kêleka xwe bide nasandin!

Navê min ..... e/ye.

Paşnavê min ..... e/ye.

Rengê çavên min ..... e/ye.

Rengê porê min ..... e/ye.

Temenê min ..... e/in.

Xwişk û birayên min ..... e/in.

Rengê ez herî zêde jê hez dikim ..... e/ye.

Lîstika ez herî zêde jê hez dikim .....e/ye.

Xwarina ez herî zêde jê hez dikim ..... e/ye.

Ajalê ez herî zêde jê hez dikim ..... e/ye.

Dersa ez herî zêde jê hez dikim .....e/ye.

Hobiyên min ..... in.

Ez ..... kîlo me.

Bejna min ..... cm ye.

Ez dixwazim bibim .....

Dibistana min ..... e/ye.

Navnîşana min waha ye .....

.....